



K.T.

Zanîngeha Mêrdîn Artuklûyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Projeya Lisansa Bilind a Bêtez

**LI GORÎ MIJARAN GOTINÊN PÊŞIYAN Ê DESTNÎŞANKIRINA WAN
DI BERHEMA CEMBELÎ KURÊ MÎRÊ HEKARYAN DE**

Yasemin AKA

13721302

Şêwirmend

Alk. Doç. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn

2018

T.C.

Zanîngeha Mêrdîn Artuklûyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

**LI GORÎ MIJARAN GOTINÊN PÊŞIYAN Û DESTNÎŞANKIRINA WAN
DI BERHEMA CEMBELÎ KURÊ MÎRÊ HEKARYAN DE**

Yasemin AKA

13721302

Şêwirmend

Alk.Doç.Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn

2018

PÊŞGOTIN

Wêje, di çand,dîrok û jiyana netewan de roleke mezin dilîze. Bi rêya wêjeyê hest û raman şîn û şahî,keser û hêviyên mirovan tên zimên. Ji ber ku wêjeya gelêrî rasterast ji aliyê gel ve hatiye avakirin,mirov dikare hemû aliyên jiyana wan,kevneşopî,adet û toreyên wan di berhemên wêjeya gelêrî de bibîne.

Di wêjeya Kurdî ya gelêrî de ji bo ravekirina hest û ramanan gelek teşeyên wêjeyî hene.Di nav van de gotinên pêşiyar,xwedî girîngiyeke bi taybet û bi hêz e.

Heta îro derbarê gotinên pêşiyar ên Kurmancî de gelek xebat hatine kirin.Ev xebat piranî ji hewldanên berhevkirinê pêk tînin.Zêdetir ev berhem wekî ferhengan tînin bikaranîn û ji agahiyên teorîk dur in.

Mijara gotinên pêşiyar her tim bala min kişandiye.Ji ber ku hager mirov bixwaze gelan an netewekê nas bike bêguman serlêdana gotinên pêşiyar rêyeke sereke ye. Di vê xebatê de min xwest bi awayekî giştî li ser gotinên pêşiyar ên Kurmancî bisekinim. Pênase û hin taybetmendiyên gotinên pêşiyar bidim xuyakirin.Piştî li gor mijaran gotinên pêşiyar berhev bikim.Û di berhema Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de bikaranîna gotinên pêşiyar li gel minakan destnîşan bikim.

Yasemin AKA

Mêrdîn 2018

KURTE

Di lîteratura wêje û çandê an di zargotinê de gotinên pêşiyar mijareke girîng e. Gotinên pêşiyar bi taybetî, ji bo mirov dersê jê derxe hatine gotin. Taybetiya gotinên pêşiyar ya herî girîng hukmê ilmî an jî şîret tê de heye. Civakî ne. Gel bi xwe ew afirandine. Ji ber vê yekê jî, ji bo naskirina civakan agahiyên herî girîng mirov dikare bi xêra gotinên pêşiyar bi dest bixe.

Ev xebata min ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de bi giştî pênaseya gotinên pêşiyar ên Kurmancî hate kirin. Ji bo vê yekê min ji berhem û makaleyên di derbarê gotinên pêşiyar de hatine nivîsandin agahiyên teorîk bi dest xistin.

Di beşa duyemîn de li gorî mijaran gotinên pêşiyar hate dayîn..

Di beşa dawî de jî min hemû gotinên pêşiyar yê di berhema Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de tespît kirin û her yek li ser kîjan mijarê hatiye gotin destnîşan kirin.

Gotinên pêşiyar pênase, wêje, civak

ÖZET

Atasözleri, edebiyat ve kültür literatüründe önemli bir konudur. Atasözleri özellikle insanların ders çıkarması için söylenmiştir. Atasözlerinin en önemli özelliği hüküm ve nasihat içermesidir. Toplumsaldır. Onları halkın kendisi yaratmıştır. Bu yüzden toplumların tanınması için en önemli bilgileri atasözleri sayesinde elde ederiz.

Bu çalışmam üç bölümden meydana gelmektedir. Birinci bölümde Kürtçe atasözlerinin genel bir tanımı yapıldı. Bazı özellikleri ifade edildi. Bunun için atasözleri hakkında yazılmış eser ve makalelerden teorik bilgiler elde ettim.

İkinci bölümde konularına göre atasözleri verildi.

Sonuncu bölümde de Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan eserinde geçen bütün atasözlerini tespit ettim ve her birinin hangi konuda söylendiğini belirledim.

Anahtar sözcükler: Atasözleri, tanım, edebiyat, toplum

NAVEROK
BEŞA YEKEM

GOTINÊN PÊŞIYAN.....	1
1.Pênase û bi giştî taybetmendiyên gotinên pêşiyân.....	1
1.1.Di gotinên pêşiyân de hunera peyv û wêjeyê.....	3
1.1.1.Şbandin.....	3
1.1.2.Rêzbandî.....	4
1.1.3.Wezn û pîvana kêteyan.....	4
1.1.4.Vegotina bi pirs û bersiv.....	4
1.1.5.Vegotina Çîrokî.....	4
1.1.6.Vegotina Mecazî û pêwendî.....	4
1.1.7.Vegotina Qerfokî.....	5
1.1.8.Vegotina duwateyî.....	5
1.1.9.Vegotina bi nakokî.....	5
1.1.10.Vegotina Remzî(sembolî).....	5

BEŞA DUYEM

2.LI GORÎ MIJARAN GOTINÊN PÊŞIYAN.....	6
2.1.Aborî (Debar).....	6
2.2.Aqilmendî.....	8
2.3.Bazirganî.....	9
2.4.Cehaletî(Nezanî).....	9
2.5.Civakî.....	10
2.6.Cografî(Erdnîgarî).....	11
2.7.Çikûsî.....	12
2.8.Darazî(Hukmî).....	13
2.9.Dijminahî(Neyartî).....	14

2.10.Rastî(Diristî).....	14
2.11.Dostanî.....	15
2.12.Evînî.....	16
2.13.Feqîrî(Xizanî).....	17
2.14.Jin û jinanî.....	17
2.15.Malbatî.....	19
2.16.Menfaetî-berjewendî.....	19
2.17.Merdî(Ciwamêrî).....	20
2.18.Merivatî(Kes û kar).....	21
2.19.Mêrxasî.....	22
2.20.Mêvan ú mêvandarî).....	23
2.21.Mîzahî(pêkenokî).....	24
2.22.Olî(Dînî).....	25
2.23.Perwerdehî.....	26
2.24.Qencîtî.....	26
2.25.Siûd(Bext).....	27
2.26.Tenduristî.....	27
2.27.Tifaqî.....	28
2.28.Timakarî.....	29
2.29.Zîraî(Kişt û kal).....	29

BEŞA SÊYEM

3.GOTINÊN PÊŞIYAN YÊN DI

“CEMBELÎ KURÊ MÎRÊ HEKARYAN” DE.....	31
ENCAM	35
ÇAVKANÎ.....	36

BEŞA YEKEM

GOTINÊN PÊŞIYAN

1. Pênase û bi giştî taybetmendiyan gotinên pêşiyane

Wateya ferhengî;¹ gotinên pêşiyane, di erebî de darb-i mesel, darab-i mesel, durub-u emsal, mesel û beyan derbas dibe. Di dema zimanê Osmanî de; ibare, beyan û îstilah hatiye gotin. Di Tirkî de; pêşî ta'bir, piştîre bûye atasözü. Di zimanê ewropî de; expresion, sayîng, idiom, parable, metaphor, paradox tê bi navkirin. Di Kurdî de ; bi awayê "peyv" û "gotinên pêşiyane" derbas dibe.

Wateya wêjeyî:² Gotinên pêşiyane; hevokên bi darazî, hukmî û bi pendî li nava gel ji bo vegotin û rexneya tiştêkî, bûyerekê an ramanekê hatine zimên in.

Gotinên pêşiyane li ser her tiştî hatine gotin. Li ser ajalan, li ser xwezayê, li ser erdnîgariyê, li ser mirovan. Bi taybetî ev yek bi awayê şibandîne hatine gotin. Şibandîna mirovan bi ajalan, bi xwezayê; ya amûr û tiştan bi mirovan û bi hev re hatiye kirin. Ji ber ve yeke carinan gotinên ku mirov bibêje sivik in jî dîsa wateya wan î girîng heye. Gotinên pêşiyane, bi taybetî ji bo edebe mirovan hatine gotin. Cihê ku perwerdehî lê kêmbûye an tune bûye û ragihandîna kêmbûye, hatine gotin. Heta motiv dikare bibêje ku jêderka gotinên pêşiyane li her welatî, gund in. Ji ber ku li gundan xwendîna kêmbûyî mirov bêti ramanên xwe bi peyvê dide der. Jixwe di şibandîna û remzên gotinan de jî ev diyar dibe. Minak: "nîr, das, ga, dar, devî, cot, kadîn, şivan û ajal".³ Li gundan mirovên zana her tim bûne afirînerên gotinan. Dema ku mirovên zana xwestîne bûyerekê, ramanekê bi kesan bidin fêmkirin û zû bê fêmkirin, hevokên ku bandorê li hişê mirovan dikin, bi kar anîne. Guherandîna gotinên pêşiyane tiştêkî xwezayî ye. Li gorî asta perwerdehî û ragihandîne dibe ku peyv û form jî bêne guhertin. Ji ber ku gotinên pêşiyane malê gel in, wê demê gel di çî astê de be dê li gorî biguherîne, tu kes jî nikare rê li ber vê yekê bigire. Gotinên jêderka wan baweriya olî jî pir in. Lê piraniya wan gotinan, ne di pirtûkên pîroz de derbas dibin. Gelek ji wan gel bi xwe re afirandine. Hinek ji wan jî dema ku mirov ketine tengasiyê, hatine gotin. Hinek gotinên pêşiyane jî hene ku mirov dikare bibêje

¹ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyane, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.8.

² Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyane, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.8.

³ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyane, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.9.

ji aliyê rêziman ve ne rast hatine gotin. Lê belê ji bo ku melodiya wan winda nebe kêm hatine gotin. Melodî û rêzbandî dike ku ew gotin baş bê fêmkirin û di hişê mirov de bi cih bibin. Wek mînak: Xweziya sêwiya, ne hêviya. Heke di vê gotinê de rastnivîs hebûya, diviyabû bi awayê "Xweziya sêwiyan ne hêvî ye" bihata gotin. Lê melodî û rêzbandiyek jê re çêbûye û bi nivîsek kêm hatiye holê.

Gotinên pêşiyar hukum dikin, darazî ne. ⁴Miroyan didarizînin tawanbar dikin.

Wekî "xeta xwar ji gayê pîr de ye". Ev gotin encama darizandinê ye, hukum e, dibêje "yê sûcdar gayê pîr" e, an rêveber e. Raste rast mirovên serok, rêveber û berpirsyar têne tawanbarkirin. Dîsa wekî "nok tê li kokê". Di vê derê de jî pêşdarazî heye û wekî zarok xerab be, ew jî dê xerab be. An bav baş be ew jî dê baş be. Gotinên pêşiyar, di nava gel de bi wext re bûne qalib û bi rêzbandî hatine zimên. ⁵Bi xêra qalibbûn û rêzbandiya wan, gotin nayên jibîrkirin û xweştir tên fêmkirin.

Wekî: "şêr şêr e, çi jin e çi mêr e".

"Tiştê nêvî, jê neke hêvî".

"Bira bira ye, hesab li derê ha ye".

Piraniya gotinên pêşiyar ji aliyê hemû kesî ve tên zanîn. Mirovên xwende û ne xwende, jin, mêr hemû kes kêm zêde gotinên pêşiyar dizanin û bikartînin. Ev jî dide xuyakirin ku gotinên pêşiyar ji nava gel derketine. ⁶

Gotinên pêşiyar bi piranî mecazî ne û ev taybetiyeke girîng e. Wek mînak: "Bi şevê dar û devî bi guh in". Gelo bira bi şevê guhên dar û deviyar çêdibin? Na. Ev gotin mecazî ye. Bi şevê him mirov ditirsin û ji xwe re guhan ji deviyar re çêdikin û him jî ji ber bêdengiya şevê guhdarîkirina şevê pir hêsan e. ⁷

⁴ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyar, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.11.

⁵ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyar, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.11.

⁶ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyar, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.12.

⁷ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyar, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.12.

Mînak; "golikê malê ji gayê malê natirse".Ev tê wateya ku mirov ji yên nêzî xwe fedî nakin an jî dikarin yên nêzîkî xwe rexne bikin. Di vê derê de, bav li lawê xwe şîretê dike û dibêje"divê tu li yê herî nêzîkî xwe miqate û haydar be".

Gotinên pêşiyên netewî ne. Li gor rewş, çand û erdnîgariya netewan hatine gotin. Carinan gotinên cîranan jî hatine bikaranîn.Ji ber koçberiyê, ji ber şer û hwd. hinek gotinên pêşiyên bûne navnetewî û li gelek netewan bi heman wateyê tê bikaranîn.Lê ev yek dîsa jî netewîbûna wan winda nake. Netewîbûna wan ji wateya wan tê fêmkirin. Mirovên netewan li ser çi mijûl bin an kul û eşên wan bi piranî çi bin, gotin jî bi piranî li ser wê yekê hatine afirandin. Wek mînak netewên di nav bahrê de, dê behsa bahrê û ajalên bahrê bikin. Mirov û netewên çiyayî dê behsa çiya û nebatên çiyayî bikin. Gelên ku pir şer dîtîbin, dê ji şer behs bikin.

Mînak;Di Kurmancî de dibêjin "Bi gulekê nabe bihar".

Di Tirkî de dibêjin "Bir çiçekle yaz olmaz".

Di Îngilîzî de dibêjin "One swallow does not make a summer"(Hehecîkek nake havîn).

Di vê gotina Îngilîzî de baş diyar e ku gotinên pêşiyên, rewşa erdnîgarî û rewşa hewa û demsalan jî derdixîne holê. Ji bêr ku mirov dikare bibêje, cihê Îngilîzan havîn lê kêma ew,havînê wekî biharê dibînin.Li cihê Kurdan jî hehecîk havînê nayên,biharê tên. Ji ber ku bihar destpêka germê ye. Lê li Îngilîstanê havîn wekî buhara erdnîgariya Kurdan e.⁸

1.1.Di gotinên pêşiyên de hunera peyv û wêjeyê

Di gelek gotinên pêşiyên de hunerên cihê cihê xuya dibê.Ji bo baş bête fêmkirin û mayinde bimînîn di gotinan de huner hatiye bikaranîn. Ev mijar gelekî kûr û dirêj e. Lê di vir de em ê tenê minakinên biçûk bidin.⁹

1.1.1.Şibandin:

⁸ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.13.

⁹ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.18.

Mînak: Kincê kete ber pînan, serê kete ber şîretan kêrî tişteki nayên.
Di vê gotinê de seriyê mirovan bi kincên kevin hatiye şibandin.¹⁰

1.1.2.Rêzbandî:

Mînak:Huner çek e, di bin çengê xwe ke, roja hewce bû veke.
Ev cûre huner ji bo fêmjirinê pir hatiye bikaranîn. Di gelek gotinan de
rêzbandî, ne di dawiya gotinan de, di serî û navê de hatiye bikaranîn.¹¹

1.1.3.Wezn û pîvana kêteyan:

Hinek gotinên pêşyan bi wezin û bi pîvan hatine gotin. Ev wezin û pîvan ne
bi zaneyî hatine afirandin. Lihevanîn û hezkirina ji melodî û rezbandiyê ew
derxistine holê.

Mînak: “Ga-dim-re çerm di-mî-ne ; mêr dim-re nav di-mî-ne “¹²

1.1.4.Vegotina bi pirs û bersiv:

Mînak:Kê mirî veğerand? Yê dil kirî.

Kê nexweş rakir? Kê ku pirs kir.¹³

1.1.5.Vegotina Çîrokî:

Mînak: Di mala bavê de zeynet in, ava cerên wan şerbet in, dayik dimirin
zeyî tên,”jinbira bê rûmet” in.¹⁴

1.1.6.Vegotina Mecazî û pêwendî:

¹⁰ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşyan, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.18.

¹¹ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşyan, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.19.

¹² Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşyan, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.19.

¹³ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşyan, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.19.

¹⁴ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşyan, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.19.

Taybetiya herî bi bandor mecazîbûna peyvên di nava hevokên gotinên pêşiyên de ne. Ev taybetiya sereke ye. Lê belê ne ku giş bi mecaz in.

Mînak: Cer li rêya avê dişkê

Mirov dikare gelek wateyan ji vê peyvê derxe. Cer bi tena serê xwe ne mecaz e. Amûr, di kîjan karî de bê bikaranîn di wê derê de xera dibe.

Cer di vir de wekî "mirov" xuya dibe. Mirovê here şer dê bimire jî.¹⁵

1.1.7. Vegotina Qerfokî:

Hinek gotinên pêşiyên jî dema ku têne gotin wekî ku mirov qerfê xwe bi hinekan bike têne fêmkirin.

Mînak: Yê ku herin masiyan, quna wan şil dibe.¹⁶

1.1.8. Vegotina duwateyî:

Di hinek gotinan de hinek peyv bi du wateyan tenê bikaranîn. Mirov bi kîjan wateyê fêmbike jî taybetiya gotinê nayê guhertin.

Mînak: Bêrxê nêr, ji bo kêr.

Peyva "kêr" di wateya kêrê (amûra ku tiştan dibire), û him jî di wateya kêrhatinê de hatiye bikaranîn. Yanê berxê nêr ji bo gonxwarina mîhanên hilanîn. Lê ev wate wateyeke dûr e. Pêşî wateya kêra birinê tê bîra mirov.¹⁷

1.1.9. Vegotina bi nakokî:

Hinek gotin bi nakokiyê, wateyan derdixin holê. Ji tezatê sêdê distînin.

Mînak: Li zik xistine gotiye ay pişt min.

Di vê derê de "pişt" ne pişt bedenê ye. Pişt hêz û piştgirtiyê ye. Yanê kesê ku alîkariya wî bike tune ye an jî kesekî jê re bibe piştgirtî tune ye.¹⁸

¹⁵ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.20.

¹⁶ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.20.

¹⁷ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.21.

¹⁸ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.

Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.21.

1.1.10.Vegotina Remzî(sembolî):

Vegotina remzî, di gotinên pêşiyên de taybetiyeke girîng e. Tişt(obje) bi awayê sembol hatine bikaranîn.

Mînak:Hespê çê, ço li xwe naxîne.

Ji mişkan dikevin hebangûşk.

Dara xebatkaran tim bi ber e.

Di van gotinan de "hesp", "mişk", "hebangûşk" û "dar" her yek remzek e û di şûna tişteki din de hatine gotin. Minak "hesp" di wateya mirovên baş û jêhatî de hatiye bikaranîn. Heke mirov jêhatî be mirov nahêle tahde bigihêje mirov. "Mişk" jî di wateya mirovan de ye. Ku mirov ne baş be, zarokên ne baş jî wan çêdibe.¹⁹

BEŞA DUYEM

2.LI GORÎ MIJARAN GOTINÊN PÊŞIYAN

2.1.Aborî (Debar)²⁰

Arvanê salê di salê de diçe.

Ax û ava mirov li ku derê be, divê mirov li wir be.

Bi ava hindik aş nagere.

Bi ciwanî bike, bi pîrî bixwe.

Bila bazar li şûvê be, ne li pirêzê be.

Bi elba mezin nede xelkê, bi elba biçûk bide.

Bila hingiv hebe, firax ji Bexdayê tê.

Bila tu xwîndar bî, ne deyndar bî.

¹⁹ Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşiyên, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.r.21.

²⁰ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşiyên Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li

Tirkiyê,Mêrdîn,2015.r.8.

Bê karî mal wêranî ye.
Bê nan û dew xeber nayê hev.
Ceh kera Misrî dike, tunebûn zilama kotî dike.
Cotkarê ro li ser hilê, nabe xwediyê malê dinê.
Çavê li deriyan, xwelî li seriyan.
Çavê nalbendan tim li siman e.
Dara şixulkeran tim bi ber e.
Destê betal li ser zikê birçî ye.
Destê betala li ser zikê vala, destê biqilêr li ser zikê têt.
Destê te bidon be, di serê xwe bide.
Destê te tijî ye, riya te vekirî ye.
Derdê malpiran ji malê wan e.
Dirêjîya malê deh gav, çî bikim mala bênan û bêav.
Divê mirov ji malê xwe re xizmetkar be.
Dîtina deyndarî ne xweştir e ji pêvedana tîremarî.
Dolaba mala xwe bi xwe bigerîne.
Doliwê malê, malxwê digerîne.
Du dest ji bo gewriyekê ne.
Elegez birinc be, erez rûn be, bergedan tune be, dîsa wê pûç be.
Ê keriyê xwe wenda kir, bi pey berxekê nakeve.
Ê li şûvê şop nîn e, li bênderê rûreş derdikeve.
Geriyên derman e, risk li ser piyan e.
Gûzek û gûzek, dibe dîzek.
Havînan berhev bike, da ku tu zivistanê bixwe.
Heçî neke hesaban, dibîne ecêban.
Heta mirinê çav li kirinê.
Kesê xebatkar nanê xwe ji kevir dertîne.
Kincê baş rewşa dinê ye.
Ku der xwar e, ew der yar e.
Mal qiloçê mêran e.
Mal têt e, kavanî şêr e.
Mala mêra, kaniya zêra.

Malbavê bûkê gavan e, qelenê bûkê giran e.
Malê dinyê qirêja destan e.
Malê dinyayê, qirêja destan e.
Malê mirov tune be, kûçik jî ji mirov biqedirtir in.
Malê te hebe, her kes dostê te ye.
Mela deynê xwe zû jibîr dike, lê deyndarê xwe jibîr nake.
Mirov dimire, deyn namire.
Nanê mirov ji ku derkeve, welatê mirov jî ew der e.
Roj heye heyvê, heyv heye salê xwedî dike.
Roj qedene, sal dahfene.
Silav li mihan e, ne li rihan e.
Xwelî li wî serî, ew ê ga da bi kerî.

2.2.Aqilmendî²¹

Aqil rêberê merivan e.
Aqilê giran mû kêr dike.
Bedewiya mirov ilm û feraseta mirov e.
Barê bîaqilan, li pişta bêaqilan e.
Bedewiya mirov ilm û marîfeta mirov e.
Çiqas tu zana be jî ji zana bipirse.
Destê zana di ser her desta re ye.
Erbab be, da ku tu girarê bixwî.
Ê ku xwend elimî, yê ku nexwend cenimî.
Ê pir zana, kêr diaxivin.
Gava ku tu zana û têgihîştîyekî bibînî, jê re xizmetkar be.
Govenda zanaya, bi nezana digere.
Karê mezin, zanebûn e.
Kes bêyî sela nabe mela.
Kewên çê, kewan li xwe dicivîne.
Mirov çiqas bi aqil be jî, her hewceyî aqilan e.

²¹ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstûtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 11.

Mirovê aqilmend, zimanê xwe di nav dilê xwe de com dike.

Peyveke kalan beramberî hezar şîretî ye.

Serê xwe her bide dîwarê kevn.

Qelem di dest de, alem di dest de.

Qenciya herî mezin, zanîn e.

Zanabûn ne ji mezinbûn û biçûkahiye ye.

2.3.Bazirganî²²

Bazar bazara pêşî ye.

Bazar bila li şûvê be, ne li pirêzê be.

Bi xwediyê xwe re kirîn û firotinê neke.

Bira bira ye, bazar cuda ye.

Erzan kirî, heban dirî.

Ê ku şerab bi deyn vexwar, du caran serxweş bû.

Garisê şîrîka, çûka xwariye.

Hem ziyaret e, hem ticaret e.

Her roj mal li milê mêrgê nayê danîn.

Kar û zîrar hevalê hev in.

Kê dinya dot, ê kirî û firot.

Ku genim kete çalê, êdî naçe malê.

Ku me firot kerê reş, em ê bixwin xurd û xwarina xweş.

Malê erzan bihîlet e, malê buha bihîkmet e.

Masî di avê de bazarê nake.

Mih nedîtî , nayê kirîn

2.4.Cehaletî(Nezani)²³

Aşê nezana xwedê digerîne.

Aqilê sivik barê giran e.

Aqilê kêr, rêya xwar bi ber hevalê xwe dixê.

²² Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê,Mêrdîn,2015.r.12.

²³ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê,Mêrdîn,2015.r.13.

Barek pirtûk li kerê bikî, ker dîsa ker e.
Barê kesê bêhiş, ling şîn dike.
Bela nezanan ji ya zaliman xerabtir e.
Baxçeyê gulan para bêaqilan.
Çûne welatê keran, anîne barê peran
Dermanê ehmeqiyê tune ye.
Di govenda cahilan de sergovendî ne kifş e.
Ew mirov nezan e, ku aqilê wî ji kîsê xelkê be.
Heft sala çû seferê, vegeriya kerê berê.
Kesê bêaqil, zimanê wî jê re dijmin e.
Kesê nezan, wek dara bê ber in.
Kesê ji yekî fam neke, ji sedî jî fam nake.
Mirovê cahil, bêtirs dibe.
Mirovê nezan, dike pirsê erzan.
Nezanî bela serê xwediyê xwe ye.
Nezanîn li dijî ilmê ye.
Qîzek nezan, gundek bezan.
Xwedê aqilekî bide bêaqilan.

2.5.Civakî²⁴

Baz bi bazan, qaz bi qazan, mirîşka kor bi dîkê kulek re
Bertîl keviran nerm dike.
Civat ji dînan çê nabe.
Çêleka vijoker navê garanekê xera dike.
Çêlekek navê garanekê xera dike.
Çû mala xalan dest vala, hemû sûcê jinxalan.
Dîn bi dînan re bizewicin, di pey re temaşe ji wan çê dibin.
Ez bi te, tu bi min, em giş bi Rebbê Alemê.

²⁴ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 14.

Ê bêalî bimîne, bêxwedî jî dimîne.
 Ê koma xwe nas neke, nikare xwe nas bike.
 Êşa tiliyê ya hemû laşî ye.
 Gelê mirov neynika mirov e.
 Golikê malê ji gayê malê natirse.
 Gotinên pêşiyên navêjin nav hêşiyên.
 Heta serê govendê xwar be, govend rast nabe.
 Jin darê şikestî ye.
 Karê sêwî, nabe nêrî.
 Kew dijminê qewmê xwe ye.
 Konê bêrêşî, ji konan der e.
 Ku mêrek biherime, gundekî jî bi xwe re diherimîne.
 Ku rêzanê deveyê ker be, wê halê me ev be.
 Kurmê darê ji darê ye.
 Li pey hêstirê meçe, bavê wê ker e.
 Malê mirov tune be, kûçik jî ji mirov biqedirtir in.
 Mih be, mû be, bila li nav kerê be.
 Şerrê xwebixwetiye, rîşa kotîbûnê ye.
 Teyr bi teyrên re, mêr bi mêrên re.
 Tu ker û bergîlan li cem hev girêde, wê ji hev belimin tir û fisan.
 Tu xwe nepesînîne, bila xelk te bipesînîne.
 Xwelî li serê wî karwanî, ku rêberê wî ker e.
2.6.Cografî(Erdnîgarî)²⁵
 Adar û newroz e, wek hev bûn şev û roj e.
 Adarê av dimiçiqe, gulanê av di rê de diçe.
 Adarê berfê da guliyê darê nema danê êvarê.
 Adar ga û çêlekê ji hevdu diqetîne.
 Adar wek jina bî ye, geh dikene geh digirî.
 Ba berî li ku we, kelekvan jî li du we.

²⁵ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşiyên Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 16.

Bayê germ, bayê baranê ye.
 Bayê reş, bayê baranê ye.
 Bayê rojava bayê benderan e.
 Bihar hat zivistan hilat.
 Çil piştî çil e, nû giha bihara ji dil e.
 Çileyê reş, debarê diqetîne li gayê beş.
 Dengê Ewran mizgîniya baranê ye.
 Dengê azmana nîşana baranê.
 Ewrê reş baran e, yê spî zivistan e.
 Êzingên hişk, donê zelal, savara libmezîna bihêle adarê.
 Heta adarê wê şev û roj bêne eyarê.
 Heta germa havînê neyê, berê daran nagihên.
 Heyva adarê, av firî serê darê, bizin kalî li ser karê, nîsanê bihar e.
 Hijdehê hezîranê, bû hezna teyranê, salê berê xwe da zivistanê.
 Kanûna paşî rê neçû aşî.
 Kanûna paşî bêvil diheside qûnê
 Kengî bibarî, hingê zivistan e.
 Ku hezîran hînzirî, tu tişt li ber nagire; îleh mêwa tirî, dara biçilo, berazê xînzirî.
 Neqebêna temûz û tebaxê ecêb agir naçe laxê.
 Pelê darê mizgîniya biharê.
 Qurmê mezin bihêle ji adarê re.
 Roj hat hêla Cizîrê, dewaran biajon ber nîrê, roj kete hêla Mêrdînê, dewaran biajon
 kadînê.
 Tavê bihara dikevin danê êvara.
 Tava bihara li serê neyaran.
 Tebaxê agir ket axê.
 Zivistan e ji sibê heta nîvro sar e, ji nîvro pê de êvar e.

2.7.Çikûsî²⁶

Bav rezeq da law, law goşîk tirî nede law.

²⁶ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şewirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015.r.18.

Çaroxan ji seyan re çêkin, wê çaroxa xwe bixwin.
Çiqas mirov zengîn dibe, mirov çikûs dibe.
Destê wî tije garis e libek jê nakeve.
Dewlemendê qesîs ji loda heyinê re hesas e.
Ê çikûs ji perê xwe têr nabe.
Ê ku nexwe, nikare bide.
Ê ku pereyên xwe nexwe, ji canê xwe dixwe.
Heta ku etar tişteki genî nekin, naxwin.
Malê xesîs û comerdan wek hev diçe.
Malê xesîs, dere fetîs.
Mirovê çikûs, ewriya (dara) gûyê xwe jî derdixe.
Ne xwar ne da hevalan, gennî kir avêt newalan.
Ne xwaro ne li xwe kiro, xelkê ji xwe re biro.
Parsek çû ber deriyê dewlemendê qesîs, sedeqe neda, şîret lê kirin.
Xursî xwediyê xiyarê çilmis î ne dixwe, ne dide kesî.
Xwedê dijminê çikûsan e.

2.8.Darazî(Hukmî)²⁷

Av di serêkaniyê de şêlû dibe.
Hayê feqîran namîne ji mîran re.
Hayê sêwiyan namîne ji zaliman re.
Ber li cihê xwe giran e.
Bav çî seg be, wê law jî ew seg be.
Bila bûk çê be, bila keça sê be.
Dê çî be, keç jî ew e.
Dijminê qenc ji dostê xayîn çêtir e.
Dîkê çê di hêkê de azan dide.
Durrê bide durnasan.

²⁷ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 19

Ê ne li şerra be, şêr e.
Hayê bizina kol ji ya bi qiloç re namîne.
Her dîk li sergoyê xwe pêt e.
Her egîdek rêveçûneke wî heye.
Her kulîlk ji bêhna xwe diyar e.
Kesê xêrê naçe dêrê.
Kuçikê gurêx, ji guran natirse.
Kuçikê gurêx, ji reyîna xwe xuya ye.
Nok tê li kokê.
Reva piskê heta kadînê ye.
Xeta xwar ji gayê pîr de ye.
Xwedê hayê vî destî ji vî destî re nahêle.

2.9.Dijminahî(Neyartî)²⁸

Bextê xayînan tune ye.
Çêlikên maran bê jehr nabin.
Di şer de ji bêbext û xayînan bitirsîn.
Dijminê bavên nabe dostên lawan.
Dijminê bêderew ji dostê bêşeref çêtir e.
Dijmin dijmin e, çi biçûk çi mezin e.
Dijminê birext, çêtir e ji dostê bêbext.
Dijminê te mûristang be jî, hesabê xwe bike.
Dijminahî kiraskî ji hesin e, ne diqete ne dirize.
Erdê dijminan agir e.
Heft salan xela be, ne salekê berberî be.
Hevalê dijmin, dijmin e.
Heyfa dijmin li dijmin nayê.
Ji dijmin û neyaran tu caran bawer nekin.
Ji dijminiyê re sînor tune.

²⁸ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şewirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 20.

Mastê payizan bidin ezîzan, mastê biharan bidin neyaran.
Neyarê bav û kalan, nabe dostê keç û kuran.
Rih dibe bost, dijmin nabe dost.

2.10.Rastî(Diristî)²⁹

Dîwarê rast xera nabe.
Dûr here, dirist vegere.
Emanet heta qiyamet.
Genimê sor her dem li ser dewl e.
Hevaltî rast xweş e.
Ku tu rast bî, tê ji qedayan xelas bî.
Kumê ristan tim qetiyayî ye.
Rastî rûmeta mirov e.
Rastî xezîna zêr e.
Serê kesê rast tim bilind e.
Xwedê hevalê rasta ye.
Xwedê şahê dilê rast e.

2.11.Dostanî³⁰

Birîna dostan birîna herî kûr e.
Di roja teng de dostê baş xuya ye.
Dil dihewe dilan.
Dost neynika dil e.
Dostaniya dostê xwe berde, dostaniya dostê bavê xwe bernede.
Dostê baş miqabilî heft birayên ne baş e.

²⁹ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 21.

³⁰ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 22.

Dostê baş canî canî, ne ku nanî nanî.
Dostê baş wekî hespê bidizgîne.
Dostê bigirîne baştir e ji yê dikenîne.
Dostê çê mirov li nivê rê nahêle.
Dostê dost mîna zêrê veşartî ye.
Dostê kevin, hespê zînkirî ye.
Dostên bavan nabin dijminên lawan.
Dostekî bikêr çêtir e ji deh birayê bêxêr.
Dostanî ji bo roja reş e.
Her tişt bi nûtî, lê dostî bi kevnî xweş e.
Ji bo xatirê dostan mirov barek xwê jî dixwe.
Ji bo xatirê xatiran, mirov diçe ser ola gawiran.
Jiyana bêdost ne jiyana e.
Mirov di agirê dostan de naşewite.
Mirovê baş, rêya xerab bi ber hevalê xwe naxe.
Mirovê dostyar dostê wî zehf in.

2.12.Evînî³¹

Agirê bengîtiyê agirekî gurr e.
Agirê eşqê germ e, dikeve nav hest û çerm e, ne dibêje fedî ye, ne jî şerm e.
Bejna heyranê, her kiras lê tê.
Bi darê zorê hezkirin nayê torê.
Bi darê zorbetiyê evîn nabe, darê zorbetiyê zû dişikê.
Bila dil î bi dil be, bila tûrê parsê li mil be, bila binê tûr jî qul be.
Birîna dilan nazengire.
Derdê dilan, hûr e, kûr e, dûr e.
Derdê dilan, kambaxiya keça ye.
Dil gewra û reşa nas nake.

³¹ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 23.

Dilê min qoqê rêxê ye, heft sala geriyam li çolê ye, sala heyşta polî poşman
vegeriyam malê ye.

Du bedew di dilekî de hilnayên.

Egîd çiqas egîd be jî, bi dilê xwe nikare.

Eywana evînê bilind û bala ye.

Evîn kirasekî ji agir e.

Evîna rast, ne hewceyî destikan e.

Evîndar, alemê kor, çar alî dîwar dibîne.

Evîndar rêya malê jî dişaşirîne.

Heger jin bi yar e, basik xwar e.

Kî hêviya yarê maye, bê jin maye.

Mehbûb ew e, dil hebandî ye.

Min dil hebû, te dil hebû, gundî û mal qebûl nebû.

Serê evîndar wekî çiyayê bilind tim bimij e.

Yara bi naz talana dilê evîndarê xwe ye.

2.13.Feqîrî(Xizanî)³²

Dilopkirina xaniyan xizanî ye.

Du parên xizaniyê ji nezaniyê ye.

Feqîr bi feqîran re bizewicin, wê parsek ji wan peyda bibin.

Feqîr û jar wek par û pêrar.

Gur hate diyaran, wey li halê feqîr û jaran.

Havîn bavê xizana ye.

Hevalê barê ketî tune ye.

Hevalê bêrîka vala tune ye.

Ji kaliyê ji koriyê mirin xweştir e ji feqîriyê.

Konê reş î dev jev e; ne nan e, ne av e.

Ku kirasê te teng be, bila dinyaya te tim fireh be.

Mirin çêtir e, ji feqîriyê.

Rûto diçe ba rûto.

³² Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez,
(Şewirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstûtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê,Mêrdîn,2015.r.25..

Rûto ha li vî alî avê, ha li wî alî avê.
Rûyê tuneyyê sar e.
Tunebûn barekî giran e, her mirov nikare bikişîne.
Tunebûn ezabê vê dinê ye.
Tunebûn kirasekî ji agir e.
Xizanî zengara mêran e.
Xwedê du tiştan bi hev re nade belengazan(yekî dide, yekî jî distîne).

2.14.Jin û jinani³³

Bejn şar e, dil î kul î jehr e.
Bûk çê ye xwesî dê ye.
Bûka xalê şekira nav dismalê.
Bûka xêlî avêt, rû ma bê şerm û fihêt.
Bûkê ne zar û ziman, xwesiyê ne dîn û îman.
Dê bibîne û dotê werîne.
Dijminê mêrxasan di nava hûçkê jinan de ye.
Diya bibîne, qîza hilîne.
Ez çûm çiyayê Dêran, min xwelî avêt bi bêran, gelek jin hene çêtir in ji mêran.
Ên ku mala xera dikin jî û ava dikin jî jin in.
Gijê mal paqijê, şayikê mal genîkê.
Her jin zarokan tîne, lê her jin egîdan nayîne.
Her jinek di mala xwe de xatûn e.
Hêrsa jinê kela dîzê ye.
Hîmê malê jin e.
Jin bincoya aşî ye.
Jin darê şikestî ye.
Jin dikare peyayayê xwe rezîl jî bike, ezîz jî beke.
Jin dikarin mêran rakin jî, winda jî bikin.
Jin hene malan xera dikin, jin hene malan ava dikin.

³³ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 26.

Jin heye zeviya ber gund e.
Jin heye bira ye, jin heye birabirr e.
Jin malê dike mal.
Jin mîreka mêrik e.
Jin stûna malê ye.
Jina baş jîn e, jina xerab jan e.
Jina baş mêrê nebaş jî baş dike.
Jina xerab bendeka lingê mêrê xwe ye.
Jinê dil kir dîwar qul kir.
Kinik ji mala re, dirêj ji şala re.
Mal bi jinê ava dibe.
Mal xizan e, kevanî nezan î.
Mala pirjina xera bûye ji bina.
Mal e têr e, kevanî şêr e.
Naz taca jinan e.
Por hilûyê mal bi gûyê, por qîjê mal paqijê.
Reva jinê, edeta dinê.
Rewşa malê kevanî ye.
Şûf xezal û xirab mal.

2.15.Malbatî³⁴

Biratî pirr xweş e, wek hemayloka bi neqş e.
Birayê min e, ji pişta bavê min e.
Dar li ser koka xwe şîn tê.
Dê û dotê şerr kir kêmaqîlan bawer kir.
Ewladê çê serweta bavê xwe ye.
Ewladê xirab mirov dibe ber deriyê dijmin.
Ê ji xwîna xwe re ne qenc be, ji kesî re qenc nabe.
Ê ku qewmê xwe nizane, xwedê jî nizane.
Giyayê hewşê tahl e.

³⁴ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 28.

Golikê malê ji gayê malê natirse.
Her berx diçe ber maka xwe.
Her malekê dînekî wê heye.
Ji dê û bavan, dikeve bi hezar hawan.
Keç û kurên malê, gula dê û bavê.
Tu yê bav û dayikekê li ku bibînî, ku xwişk û birayên te jê bibin.
Zikê dêya bîstan e.

2.16.Menfaetî-berjewendî³⁵

Bê fêde bavê mirov nakeve ba dêya mirov.
Bêmalo; bêxaltî û bêxalo, bimalo; bixaltî û boxalo.
Bênder sap bû Heyder ap bû, bênder ji saptî de ket Heyder ji aptî de.
Birayên xwarinê pir in.
Çavên mela her li miriyan e.
Çûne şûna miriyan, her kes li yên xwe giriyan.
Daxwaza koran, du çavên reş in.
Di firehiyê de dostê mirov zehf dibin.
Dîn û îman nan e, nan tune be bende îro êzidî sibe misliman e.
Eger bi mal î, bixalet û xal î.
Gava ez xwedî milk û mal bûm, ez xwedî bav û bira bûm.
Genim firîk e, mele şirîk e.
Heçî bi mal e, bixaltî û xal e.
Her kes royê di hindava xwe de dibîne.
Her kes xwe li çirayên ronî digire.
Hevalê parî, naçe arî.
Hevalên şahiyê zehf in, ên şînê kê m in.
Ji bo êmek ceh, nebe hevalê kerê.
Karê ne ji min re, bayê wê di ser min re.
Kesê bi mal e, hemû kes xal e.
Ku ga ket erdê, kêr pîrr dibin.

³⁵ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyê, Mêrdîn, 2015. r. 29.

Kû der xwar e, ew der yar e.
Malê te hebe her kes dostê te ye.
Mir kerê qazî, her kes çû tazî, qazî bi xwe mir, kesî nekir lê gazî.
Mirina qelender ji mele re şîn e, mirina dewlemendan ji mele re mizgîn e.
Pirêzeya me bisap e, kur bixal û ap e.
Newala di ber re, her kes ji xwe re.
Wexta ku gîha bû, kes ne xuya bû, dema bû firîk, Hemo û Heso bûn şîrîk.
Zilamê dewrê ne, kîjan agir xweş be, li wê ne.

2.17.Merdî(Ciwamêrî)³⁶

Berê xwe bidin merdan nebînin derdan.
Bi nanekî merd nabe, bi darekî mêrxas nabe.
Camêrî ne karê her kesî ye.
Comerd hespek û qespek li balê yek in.
Dayin ji dil e, ne ji heyînê ye.
Deriyê cinetê ji mirovê sexî re vekirî ye.
Destê camêran nayê girtin.
Divê mirov li dinê pişta xwe bide mêrekî çê yan jî çiyayekî asê.
Dizê comerd, deriyê bihuştê vekir.
Dostê merda, dermanê derda.
Ê maldar ne zengîn e, yê dayî zengîn e.
Mêrê camêr nakeve tora nemerdan.
Mêrê çê bi lepê xwe ye.
Sifra merdan tim raxistî ye.

2.18.Merivatî(Kes û kar)³⁷

Axa jin û mêr ne ji hev be, tev nagere.
Bê Xwedê dibe, bê xwedî nabe.

³⁶ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r.31.

³⁷ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r.32.

Bila ez bûka metika xwe bûma, firaqşoka şorbe û dimsê bûma.

Bûka xalê delaliya malê.

Deve çî qasî li dûrî hev biçêrin, dîsa guhê wan li ser hev e.

Dewê xwe yê ceribandî nede bi mastê xelkê yê neceribandî.

Di rojên teng de, mirovên mirov bi kêrî mirov tîn.

Ê dotmama xwe neecibîne, dê bêdunde bimîne.

Ê paniya mirov jê nebe xwîn, li ser mirov nake şîn.

Her hoz bi keriyê xwe re.

Her kewek bi banga kewê dikeve dehfê.

Here dera ku xwediyê te lê hebin.

Keçik li metê, lawik li xalan diçin.

Kêr destiyê xwe nabirre.

Kiras ji sako nêzîktir e.

Ku diz ji malê be, dikarin gê di kulekê re derxînin.

Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê tine.

Meçe cihê ku kesê te lê tune ye.

Meriv gazinan li merivê xwe dike.

Merivê merivan çiqas xirab be, zêrê meriyatîyê veşartî ye.

Mirov bi çûn û hatinê dibin mirovên hev.

Mirovê te ku bibe kevir jî, li lingê te nakeve.

Pismamê mêriv bibe kevir, li çoka mêriv nakeve.

Xizmê xerab kula kêlekê ye.

Xwarzê tîn li xalan, wek ciwanîk tîn li fehlan.

2.19.Mêrxasî³⁸

Bela tîn serê mêran.

Ber li cihê xwe giran e.

Berf li çiyayan dibare.

Berx li berên tê.

Berxê çê di kozê de diyar e.

³⁸ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 34.

Berxê nêr ji bo kêr.
 Bê derpê bigere, serê xwe li ber zaliman xwar meke.
 Bila mirov mêr be, bila rojekê li dinê be.
 Bila mirov mêr be û kelemê ber çavên dijminan be.
 Deynê mêran li mêran deyn e.
 Dewsa şêran, mane kundê dêran.
 Di nav mêran de mêr be, di nav şêran de şêr be.
 Egîd carekê dimire, tirsok hezar caran dimire.
 Ez garisê şeng im, mêrê roja ceng im.
 Ga û parî li ba mêrxasan yek e.
 Ha li çongê ha li navê.
 Hemî mêr nabin şêr.
 Hesp siwarê xwe nas dike.
 Heyrana kûçikê gurêx, li berriyê diewite, li zozanê gur mihê berdide.
 Hezar tajiyên te nikare kîvroşkekî min reke.
 Kihêl di bin mêrxasan de dibezin.
 Ku mirov çendî mêr be, ji mirov mêrtir hene.
 Kurd şêrê çiyê ye, her mêrek bi sed mêrî ye.
 Mala zêran xera dibe, mala mêran xera nabe.
 Meriv ne bi nanekî nandar dibe, ne bi derbekê mêrxas dibe.
 Mêr heye seranser, mêr heye beramber, mêr heye xwelîser.
 Mirov mêr be, sed û hezar yek in.
 Mirovê mêrxas li pêş û paş nanêre.
 Şêr şêr e, çî jin e çî mêr e.
 Teyrê goştîxur, nikilê wî kêr e.
 Tu kesî ji mêraniyê xisar nedîtiye.
 Yan xwe bide çiyayekî asê, yan mêrekî çê.

2.20.Mêvan ú mêvandarî³⁹

Binê sivinga hişk, riya mêvanan e.

³⁹ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyê,Mêrdîn,2015.r.36.

Cih ji deran teng nabin, cih ji dilan teng dibin.
 Çûme mala dewrêşan, dane ber min mastê gamêşan.
 Dilê mêvana nehêlin, wê bixwe herin.
 Ezimandina yek carî, behsa sed salî.
 Hatina mêvan bi dest mêvan e, lê çûna wî bi dest mazûban e.
 Ji ber mêvanan nerevin, mêvan bereketê tînin malê.
 Ji mêvanê dilan re cih teng nabe.
 Li mala bêmalxwê nebe mêvan.
 Mala bê mêvan, gundê bê şivan, herdu jî bê guman.
 Mêvan berî rûnê mîr e, gava rûnişt esîl e, dema rabû begzade ye.
 Mêvanê bê heyam ji kîsî xwe dixwe.
 Mêvanê biwext, wek axê ser text.
 Mêvan bi nan û ava xwe tên.
 Mêvanê destvala, ne bi xêr ne bi ahla.
 Mêvanê dilan, hat li ser gulan.
 Mêvan ji mêvan aciz e, mazûvan ji herdu ciyan aciz e.
 Mêvan li heyîn û tuneyînê nanihêre.
 Mêvan mêvanê Xwedê ye.
 Mêvana neqewirîne wê bixwe herin.
 Mêvanê xerab carekê nan dixwe.
 Nanxwarina bi mêvanan re mîna xwarina şêran e, nanxwarina bi tenê mîna xwarina roviyan e.
 Rizqê mêvana fireh e.
 Rizqê mêvan bi mêvan re ye.
 Salê herî siltan î, mehê herî mêvan î, her roj herî li cihê sa'nî.

2.21.Mîzahî(pêkenokî)⁴⁰

Ava te berqiyameye, biçirrine caw cawê te ye.
 Bayê gurgurî weke jina virvirî.
 Biçûkên malan kûçikê malan.

⁴⁰ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 38.

Bi roj nalenal e, bi şev hespê fal e.
 Bi sê awayî dost hene; cano, malo, gano.
 Bûk yek bû; xesû felek bû, bûk bûn dudu; xesû dan nêv hevdu, bûk bûn sisêyan; xesû şandin rêsiyan, bûk bûn çaran; xesû xistin nav daran.
 Çil hevling kirine pînekê, gotine; " Çiqas cihê me fireh e."
 Dinya bi tira bûya, wê hemû behra keran bûya.
 Gava gunnê kerî hat firkandin, ew ê xwe hespê fal bihesibîne.
 Hesp tune, alifan çê dike.
 Her keçel li ber çavê dêya xwe porherîrek e.
 Kerê guhsist tîrê jidiyayî dike.
 Kerê ku ji karwên ma zirrî, pîreka ku hevîrê xwe stira û enirrî, seyê ku xwediyê xwe ji paş ve dirrî ew ne tu tişt in.
 Mar ji pûngê aciz bû, pûng çû di devê qula mar de şîn hat.
 Malxwiyê min Xello be, xwarina min wê çilo be.
 Malxwiyê me Elo be, wê halê me halê Qolo be.
 Pîra navran qusiyayî, nû bi xwe hisiyayî.
 Qoçelê kera nayê tim dehşik in.
 Rovî xistine newalek xalî jê heyî bûye walî.
 Sal û mehê carekê nêçîra min hat, ew jî gûyê tajiye min hat.
 Sofiyê remezanê, wek kerê dû garanê.
 Şêwra jinan, bêriya bizinan.
 Tajiye Mihê Koro berdidane kîvroşkan diçû qijikan.

2.22. Olî(Dîmî)⁴¹

Alim divê ku baweriyê bi ilmê xwe bîne.
 Alimek beramberî alemekê ye.
 Avahî nabe bê asas, mirov bê rojî û nimêj nabin xelas.

⁴¹ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 40.

Axa miriyan sar e.
 Axir û aqûbet heta deriyê gorê ye.
 Bê destmêj, bi cilê qirêj nabe nimêj.
 Bêyî emrê Xwedê, çilo ji darê naweşin.
 Bi ilmê mele bike, lê bi emelê wî neke.
 Çi tê ji Xwedê tê.
 Dan û standin di destê xwedê de ye.
 Derew dijminê Xwedê ye.
 Deriyê xêran nayê girtin.
 Evd dike xeyal Xwedê dike betal.
 Ewladên şeva îne, ewladên salih in.
 Ê ku rojî negre, buhayê cejnê nizan e.
 Heçî ji Xwedê xafil e, ew kafir e.
 Hezar salî li dinê bî, rojekê tê mêvanê gorê bî.
 Ji mirinê re çare nabe.
 Îman û guman li cem hev nabin.
 Însaf ku heye, nivê îmanê ye.
 Kes nikare qismetê kesî bixwe.
 Mirin benikê sor û spî ye, li devê deriyê her kesî ye.
 Mirin paqijîya dinyayê ye.
 Nimêja dema dema xenzîrê devê çema.
 Nimêja di wextê de wek petêxê sor di lemê de.
 Nêta remezanê cejna qurbanê.
 Xîret ji îmanê ye.
 Dinyê teqereq e, heta here dinya heq e.
2.23.Perwerdehî⁴²
 Çerxa cîhanê bi xwendinê digere.
 Dêya baş ji hezar fêrkerî çêtir e.
 Dêya baş ji hezar mamosteyî çêtir e.

⁴² Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şewirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstûtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015. r. 41.

Ê ku xwend elimî, yê ku nexwend cenimî.
Heger ders e, herfek bes e.
Her ketinek hînbûnek e.
Her xwenda, nabe mela.
Hînbûn roniya çavan e.
Ji hînkirinê re hêncet nabin.
Ku kete meha şeşan, zarok dayne ser merşan.
Law ji bavê re, keç ji dê re.
Mal mekteb e.
Qelem di dest de, alem di dest de.

Zarok bi ketin û rabûnê mezin dibin.

2.24.Qencî⁴³

Cîranê çêyo, bav û dêyo.
Çê kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro.
Hezar pez li bin siya darekê mexel tîn.
Ku pîr xêrker be, êvarê îne zehf in.
Ku te nan da, têt bike.
Ku te xêrek kir, xêra xwe bi serî bike.
Ku tu ji vê dinê çi bidî bi destê xwe, ew ê bi te re bê wê dinê.
Ku yek gavekê ber bi te ve hat, tu du gavan bi ber wî ve here.
Li vê dinê kesên rind nebin, kevir li ser kevir namîne.
Mirov dîmirin, lê qencyê wan namirin.
Qencî nayên jibîrkin.

Qencî qencyê nas dike

2.25.Siûd(Bext)⁴⁴

Bext kela mêran e.
Bext hebe text bixwe têt.

⁴³ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r.43.

⁴⁴ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r.44.

Bextê dê cihêzê qîzê.
Bila çavekî meriv tunebe, bila bextê meriv hebe.
Çerxa felekê geh li jor e, geh li jêr e.
Dema siûd hat serî, bila bizirre wek kerî, dîsa jî xelk wê bêje aferî.
Feqîr diçin diziyê, heyv ji êvar de derdikeve.
Hespa her kesî li gorî bextê wan dibeze.
Jinê bîne ji zibalê meyzîne li siûd û qibalê.
Piçek siûd çêtir e, ji malê dinyê.
Serê xwe veke, li bextê xwe mêzeke.
Siûd xerab be, diran di pelûlê de dişkê.
Şensê xelkê lata diqelêşe, yê me beqa reş bi me de vedireşe.

2.26. Tenduristî⁴⁵

Berî baranê ba ye, berî mirinê ta ye.
Bila mirin hebe, pîr bûn tune be.
Bila mirov derdê dilan bikişîne, êşa diranan nekişîne.
Bizina reş e, her roj nexweş e.
Çavê şeliqî ji yê kor çêtir e.
Dar bi kurman, mirov bi derdan dikevin.
Dar bi ziravî, mêr bi stûrî dişkên.
Derdê bêderman tune ye.
Dinya gav û çav.
Diran êş e, dermanê wê kêşe.
Êşa tiliyê ya hemû laşî ye.
Heta ku însan bi destê xwe nemeşe, qedrê lingê xwe nizane.
Heta mirov nexweş nebe, mirov nizane şev çiqas dirêj e.
Kêm kêm bixwe, her tim bixwe.
Pelgên sîran bidin pîran.
Pîrî û hezar eybî.

⁴⁵ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Lî

Tirkiyê, Mêrdîn, 2015. r. 45.

Tava sibeha nede mirov, tava êvara fêde nake.
Xwedê derd daye, derman jî daye.

2.27.Tifaqî⁴⁶

Bênder bi ba tê rakirin, eşîr bi tifaqê tê rakirin.
Çar bira kelehêkê ava dikin.
Dest destan dişo, dest vedigere rû dişo.
Destê tenê destê Eliyê Şêr be jî deng jê nayê.
Du dilên tevahî, çiya didin ser çiya.
Dudu karwan e, sisê bazirgan e.
Gundiyan dest hilda, axa gund berda.
Hespê tenê tozê nake.
Kevirê bi tenê nabe dîwar.
Kê dinya xwar? Jin û mêrên ji hev re yar.
Ku du dil bibin tevahî, dê çiya hildin ser çiyayî.
Malek bi yek be, gundek; gund bi yek be, eşîrek; eşîr bi yek be, dûgelek pê nikare.
Mirin bi hevalan re xweş e.
Itîfaqa mûriyan çiyayan hildiweşîne.
Peza tenê guraxwarî ye.
Tev bikin tev bixwin.
Tifaq çiya werdigerîne.
Yek yek e, dudu komek e.

2.28.Timakarî⁴⁷

Bertîl keviran nerm dîke.
Çavbirçîtî mirovan li agirê sor diqelibîne.
Destê wî tijî garis be, kulma xwe lê xî, hebek jê narije.
Dinya bûye kes, kesî negotiye bes.

⁴⁶ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşîyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r.46.

⁴⁷ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşîyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L₁ Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015. r.47.

Kedkiro, kednexwaro.
Kesê tima malê xwe naxwe.
Malê merivê tima, li xelkê helal e.
Mirovê tima malê xwe naxwe.
Rêya timakaran di qûna miflisan de ye.
Timayî birakujî ye.
Timayî cehenimayî.
Timayî gû dide xwediyê xwe.
Timayî kêmayî.
Timayî li rê mayî.
Yê ku bi pey kara pîrr ketiye, ya hindik jî wenda kiriye.
Yê ku timayiya çerxê kiriye, gore qetiyaye.
Yê tima bê kefen dimire.
Xweyiyê zêran kulê kûr dike, zêran hûr nake.

2.29.Zîraî(Kişt û kal)⁴⁸

Barana gulanê, malê xiristiyan e.
Bayê rojava bayê bêndera ye.
Berf havênê erdê ye.
Bi payizî zû dake, bi buharî zû rake.
Bihara pêşîn ji bo heywanan, bihara paşîn ji bo mirovan.
Bihara pez, payîza rez.
Dara dîne bi heft gava, wê bibîne heft bava.
Eger ji cotyar re lê hat, dê xwe bipesinîne.
Ewrê nîsanê baran e, xercê xozanan kotan e.
Ê neçîne, naçine.
Gulan e şîngîniya dasan e.
Heta gulanê, dilê xwedîrezan kul û kovan e.
Heta pirêze neşewite, çandinî xurt nabe.
Heyva gulanê nayê tava baranê, pezkûvî li ser zanê.

⁴⁸ Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên L1

Tirkiyê, Mêrdîn, 2015. r. 48.

Heyva tebaxê, tirî ket miştaxê.
Ku hate tavek ji tavên nîsanê, çêtir e ji cohtê meydanê.
Nîsan e, çipik bi kîsan e.
Sala berf netê, girî bi halê me tê.
Sala bimij e, genim dirije.
Salekê şûv yekê tov.
Şilî şahî ye.
Tebax e tirî raxe.
Tu çi bireşînî, tê wî biçînî.

BEŞA SÊYEM

3.GOTINÊN PÊŞIYAN YÊN DI "CEMBELÎ KURÊ MÎRÊ HEKARYAN" DE

- Ya dîzikê dê her bibêje kaskê. (Civakî)⁴⁹
- Xalan xwarzan rakirin, maman birazan binax kirin. (Civakî)⁵⁰
- Dijminên xwe bi hingivînê dixendiqîne. (Menfaetî-Berjewendî)⁵¹
- Xêra malê biçê mizgevtê betal e. (Olî-Dînî)⁵²
- Gîskê nede nîskê. (Bazirganî)⁵³
- Mîrê şêran, li meşka şêran de, ser pişta şêran, şêr bînin û şêr biben. (Mêrxasî)⁵⁴
- Kê barê armûşê xwe daye barê livayê. (Bazirganî)⁵⁵
- Bila mirov dîkilê rojekê be, lê mirîşka gelek rojan nebe. (Mêrxasî)⁵⁶
- Xudanê sebrê Mîrê Misrê. (Darazî)⁵⁷
- Xwedê derd dayîn, derman jî dayine. (Olî-Dînî)⁵⁸
- Hosta necar hosta necar tu binive wekî her car Xwedê yek e delîl hezar. (Olî-Dînî)⁵⁹
- Kerê xiyalekê ye, karvanî xiyalekê. (Menfaetî-Berjewendî)⁶⁰
- Berxê nêr bona kêrê. (Mêrxasî)⁶¹
- Balîfê wan kevir, doşeka wan ax û lehêfa wan jî berf, baran, şilove û tergişk e. (Feqîrî-Xizanî)⁶²
- Jina baş jiyan, jina nebaş jan e. (Jin û jinanî)⁶³

⁴⁹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.8.

⁵⁰ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.9.

⁵¹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.9.

⁵² Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.9.

⁵³ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.11.

⁵⁴ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.13.

⁵⁵ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.

15.

⁵⁶ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.16.

⁵⁷ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.16.

⁵⁸ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.16.

⁵⁹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.16.

⁶⁰ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.16.

⁶¹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.17.

⁶² Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.19.

⁶³ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.32.

- Diyê bibîne û dodê ber hilîne. (Civakî)⁶⁴
- Her berxek diçe maka xwe ve. (Malbatî)⁶⁵
- Her giyayek ser reha xwe şîn dibe. (Civakî)⁶⁶
- Silav a miya ye ne ya riya ye. (Menfaetî-Berjewendî)⁶⁷
- Jina bînin esliya guh bidin ecêbiya. (Civakî)⁶⁸
- Jin stûna malan in. (Jin û jinani)⁶⁹
- Gundî nabin cindî. (Civakî)⁷⁰
- Her teyrek refa xwe ye. (Civakî)⁷¹
- Siya şêrî razê bila şêr te bixwet. (Mêrxasî)⁷²
- Hindî av dimînin gerava de genî dibin. (Civakî)⁷³
- Şûna gulan,şînbin şîlan. (Civakî)⁷⁴
- Zê(Rûbarê Zapê) kişk e,ber ku Erzikini(çemê Erzikini) li pişt e(herêma Colemêrgê)(Erdnîgarî)⁷⁵
- Esîla bipirsin,bêesîla bitirsin. (Esaletî)⁷⁶
- Serder daketin, binder rabûn, geverişkî bone xatûn. (Civakî)⁷⁷
- Karik her di bin seviya de nabin. (?)⁷⁸
- Beq danîne ser berika nexşîn, dîsa xwe avêtiye nav kûrê(heriyê,teqnê). (Esaletî)⁷⁹
- Weliya dibin xwelî,xweliyê jî çêdibin welî. (Bext-Siûd)⁸⁰
- Tabî'ê amê here Şamê. (Tifaq)⁸¹

⁶⁴ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.

33.

⁶⁵ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.33.

⁶⁶ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.33.

⁶⁷ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.48.

⁶⁸ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.55.

⁶⁹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.55.

⁷⁰ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.55.

⁷¹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.56.

⁷² Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.56.

⁷³ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.57.

⁷⁴ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.60.

⁷⁵ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.64.

⁷⁶ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.65.

⁷⁷ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.65.

⁷⁸ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.65.

⁷⁹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.66.

⁸⁰ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.68.

⁸¹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mirê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.70.

- Karê gavanî jî siwariya kerê ye. (Aborî-Debar)⁸²
- Em rakin nanê xwe berdî ganê xwe. (Dijminahî-Xayintî)⁸³
- Mirov çî diçîne wê hiltîne. (Civakî)⁸⁴
- Nanê paşan dixwin, serê gavanî sond dixwin. (Menfaetî-berjewendî)⁸⁵
- Pêyên şêxan bi çav in û xwedî keramit in. (Olî-Dînî)⁸⁶
- Însan e, şîrê xav vexwariye. (Dijminahî-Xayintî)⁸⁷
- Êdî kêzê jî hatiye rêzê. (Perwerdehî)⁸⁸
- Çav çavan şerm dîkin. (Civakî)⁸⁹
- Şûr kavlanê xwe nabire. (Merivatî)⁹⁰
- Çavekî mirov kor dibit mirov destê xwe didet bêr yê din. (Darazî)⁹¹
- Xeta xar ga ê pîr daye. (Perwerdehî)⁹²
- Mar jî heta rast nebe naçe qula xwe de. (Diristî)⁹³
- Çûka xem e xabûr çem e. (Mêrxasî)⁹⁴
- Kevirê zarûk bavêjin binê gerê mezin nikarin bînin der. (Aqilmendî)⁹⁵
- Sîmerxê jî qeder betal nekiriye. (Olî-Dînî)⁹⁶

⁸² Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.97.

⁸³ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.105.

⁸⁴ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.105.

⁸⁵ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.106.

⁸⁶ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.109.

⁸⁷ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.109.

⁸⁸ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.110.

⁸⁹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.118.

⁹⁰ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.120.

⁹¹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.120.

⁹² Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.121.

⁹³ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.121.

⁹⁴ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.124.

⁹⁵ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.125.

⁹⁶ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r.126.

- Hevalê qirê dem bi go ye. (Hevaltî-Dostanî)⁹⁷
- Xwedanê mirî kor e. (Merivatî)⁹⁸
- Jiyana wekî marî ye, destdana wê nerm, geztina wê cankuj e. (Îmamê Elî)(Darazî)⁹⁹
- Hespek û qespek yek e. (Ciwamêrî)¹⁰⁰
- Mastê seyê herimandî dê bo seyê bit. (Civakî)¹⁰¹
- Daweta mîran kir feqîran. (Menfaetî-Berjewendî)¹⁰²
- Însan pîr dibe lê dil pîr nabe. (Evînî)¹⁰³
- Însan teyrê bê çeng e. (Huner)¹⁰⁴
- Şerma dinyayê ji ezaba goran mezintir e. (Civakî)¹⁰⁵
- Feleka me xaîn e. (Bext-Siûd)¹⁰⁶
- Şêr şêr e, çî jin e çî mêr e. (Mêrxasî)¹⁰⁷
- Serê kaniyê şêlû ye. (?)¹⁰⁸
- Botanî bi mîrê xwe, Şîrwanî bi şûrê xwe. (Mêrxasî)¹⁰⁹
- Jin dara şikestî ye. (Jin û jinanî)¹¹⁰

⁹⁷ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 128.

⁹⁸ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 128.

⁹⁹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 131.

¹⁰⁰ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 138.

¹⁰¹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 153.

¹⁰² Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 155.

¹⁰³ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 159.

¹⁰⁴ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 160.

¹⁰⁵ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 173.

¹⁰⁶ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 174.

¹⁰⁷ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 177.

¹⁰⁸ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 178.

¹⁰⁹ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 179.

¹¹⁰ Colemêrgî, Însan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.r. 180.

ENCAM

Wek ku tê zanîn wêjeya gelêrî ya Kurdî pir dewlemend e. Ji bo îfadekirina hest û ramanan gelek şiklên teşeyên wêjeyî hene. Di nav van de gotinên pêşiyên beşeke girîng e.

Heta niha gotinên pêşiyên bi gelek awayan hatiye pênasekirin û senifandin. Ji aliyê mijarê, cudahiyan zaravayan, hevoksaziyê û hwd.ve hatine senifandin.

Di naveroka vê xebatê de min hewl da ku bi awayekî giştî pênaseya gotinên pêşiyên ên Kurmancî û her wiha li gorî mijaran senifandina gotinên pêşiyên bikim. Li gel mînakên li ser vê senifandinê çend tesbîtan parvekim. Ji van tesbîtan a herî balkêş li gorî min berfirehbûna mijaran bû. Dema mirov lê dinêre dibîne ku li ser her mijarê gotinên pêşiyên derdikevin pêşberî me. Li gorî şert û mercan, li gorî demê, li gorî mijûlbûna mirovan naveroka gotinên pêşiyên hatiye avakirin. Civak bi çî ve mijûl be bêtir li ser vê mijarê gotin hatine afirandin. Ji ber ku gotinên pêşiyên malê gel in û wan ew bi xwe afirandine mirov dikare hemû aliyên jiyana wan di gotinan de derdikave holê. Mebesta min a sereke ew bû ku jî aliyê mijarê ve berfirehbûna gotinên pêşiyên hinekî din diyar bikim. Ev yek bi xwendina berhema Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan zelaltir bû ji bo min. Mirov dikare bibêje li ser hemû mijaran gotin di vê berhemê de hene. Hinek gotin du sê caran hatine dubarekirin. Ev yek li gorî pêwistiyê derdikeve holê. Mirovê wê demê bi çî ve elaqedar be gotin li ser wê yekê tîndar afirandin. Dubarekirina van gotinan balê dikşîne ser mijarê û tesîreke bi hêz li ser hişê mirov çêdike.

Wekî encam dikarim bibêjim ku di vê xebatê de pîralîbûn û berfirehbûna mijaran a gotinên pêşiyên ên Kurmancî careke din berbiçav bû. Ji bo axaftineke bi tesîr, ragihandineke rengîn û bi hêz divê mirov gotinên pêşiyên di axaftina xwe de û di jiyana xwe yî rojane de bikarbîne.

ÇAVKANÎ

- Mazî, Çiya, Ferhenga Gotinên Pêşyan, Weşanên Elma, Çapa Yekem, Stenbol 2005.
- Urtekin, Vedat, Li Gorî Mijaran Gotinên Pêşyan Ên Kurdî, Projeya Lîsansa bilind a bêtez, (Şêwirmend Ramazan Pertev), Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên ^{L1} Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015
- Colemêrgî, Ênsan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Weşanên Avesta, Çapa sêyem, Stenbol, 2013.



T.C

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de

Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve

Kültürü Anabilim Dalı Tezsiz Yüksek

Lisans Bitirme Projesi

**KONULARINA GÖRE ATASÖZLERİ VE CEMBELÎ KURÊ
MÎRÊ HEKARYAN ADLI ESERDE GÖSTERİLMESİ**

Yasemin AKA

13721302

Danışman

Yrd.Doç.Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin 2018